Sal 2 — Hejmar 40

Duşemb 6 Adar 1944

# ROJA NÛ

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 15 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên ingilîzî. Bihayê Hejmarekê: 15 Qemerî.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Dîwan û gerînendekariya Rojnamê: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

KOVAR Û ROJNAME

## STÊR

Ûsê Hersan, hevalê me ê ku vê paşiyê hew hînê xwendina Kurmancî bûye wek zarokekê ku lîstokekê bi bûne, rojnameke nû da dest min û bi gewz got: Va ye Stêr!

Rojname, di dest min de û bihnekê damam, panzdeh sal berê bi cih û war hat bîra min..;

Xûkirin ji dilî, bindestî, silî, kêmanî, hezkirin û prestîşî ji azayî, serdestî, mêranî, tolbazî hîmên avaya nejadê kurd in...

Ev şerdeya bilind û hamandîde, li wê xûna wan a ji her gemarê parastî û paqij ra gihaştî bû dil û canê min, mejiyê min jî pê hati bû avdan.

Wê xûna germ û jehredar ji ne çarî pê çax avêti bûm hora parastinê, parastina gel û welêt, bê yar û heval, bê çek û ber û dest vala.

Min bi van dest û zendên xwe ên jar, xwe da bû ber azakirina Kurd û Kurdistanê, xwe da bû avakirina kavilê me ê wêran wek her kurdî bi hêvî û baweryak bêlerzîn... heşê min li vekirina rêkê, çavê min li çirûska roniyakê digeryan.

Hilma min çikyayî, dilê min teng bû.

Di vê diltengyê de, xwediyê Stêrê mîna rojê li min hilatî bû tîrêjên wî ên tîndar giyanê min zende, dilê min xurt, xûna min germ kiri bû, nola agirekî da bûm teqandin. Agirekî xurtîya wî karî bû neyar bilerizanda xurî û pêtên wî ew di yek pifê de bisotana...

Erê wê çaxê di dibistana biyaniyan de bûm, navê Kurd û Kurdistanê yekcar ji me veşirtî bû, kesî ne karî bû, banîna ser zimanê xwe.

Zarokên wek min kurd bûn, wan jî her kê di şîverekê ra xwe digihandin neyaran û xwe dikirin ji wan, bi çavkî kêmtirî li kurdan dinêrîn, ji xwe çavsorî û bê rêtiya neyaran û dijminahiya wan a bê behane bi kurmanca ra hundurê min ji wan berşojî bûbû, di serê min de hêlîna ramanek bilind, di dilê min de hîmê armancek rast hati bû danîn.

Armancek felatkar! Ez bûbûm Welatparêz, welatparêzkî agirêj û dijwar, wek oldarekî min bi dest eşkere kirin û ajotina doza xwe di nav hevalên xwe ên kurmanc de kir.

Hevalê min li ser vê pirsa ne bihîstî û bi gêdûk daman.

Gazind ji wan ne dibû, dijmin wusa bi mejî yên me lîsti bûn ku me bi xwe bawerdikir kurd tu ne ne, Kurmancî ne zimanê xwendin û nivîsandinê ye. Vajî wan, ji tu deva, heya ji dê û bavê xwe jî, me tu tiştî ne bihîstî bû û ne dibihîst.

Gêdûka wê, dijmina ji me bi bihîsta tavilê bê eman em bikuştana.

Azaya Kurd û Kurdistanê û gerandin bi destê kurda bi tiştekî ne bûyî bû û ji xwe bi tu mejî ya ve jî ne dizeliqî. Lê carkê ketibû serê min di mejîyê min de diliviya û ez dajotim.

Bi hêvîya ku ji xwe re kanyakê bibînim, nivîsarên dirokî û civakî yek bi yek min li hev dixistin, tu ronyê xuya ne dikir, te digot qey ev Kurd û Kurdistan îro nuh hatiye rastê û ji min pêve haya kesî jê tu ne. Bes navê kurd bi tenê min bi dîta ajotina hevala hêsan dibû.

Di wê gêjê de Mîr Kamiran mîna brûskê di gazya min hat, di buhurekî bê qam ra derbas kirim. Di kovareke kevn û avêtî de min nivîsarek wî bi navê (Li kurda hûr bûna dîrokî û civakî), dît, ji kêfa min ra,. ji xurtiya dilê min ra pîvan û sînor ne ma bûn-xewna min rastiyek bilind, ramanek bê buha bû... pêşdarê min di nav hevala de kiri bûm sergelî û rênas. Gelo ew neyaren ku li mirîna me kurda dilezandin û bi vê guftê derew li xwe û li me dikirin, îro li pêş vê havila me a mezin û ne mir nemaze ev her çar rojnamên kurmancî ku xwediyê wan çend rêzên ku bi destê wan hati bû veşartin derdixe çi dibêjin? Bersiwa wan vaye ez didim: Bila zanibin em na mirin, em ne ê mirinê ne, êdî ji dava fen û xapên wan derketine. Ber bi azayî û jînê ve bi gavên direj bi lez nêzîk dibin

REŞÎD KURD

## Bi Hezaran Ton Bombe

LONDRE—Refên emerîkanî biro direjî axa Germanistanê kirine û li bajarê Brunswîkê û li zehf balafirgehên erdê elemana ên mezin xistine, nêçîrvan û 2.000 bombeavêj têkilî wan êrîşan bûne, û 6.000 ton bombe avêtine hêjagehên elemanî. Balafirgehên almanî yên Bramşe Lingen, Vexte, Kuakenbruk, Diofolz û Alkorn derbine giran xwarine 33 mekîneyên elemanî hatine avêtin erdê; 15 bombeavêj û 3 nêçîrvanên Hevalbendan venegeriyane warên xwe.

Nû-york— Di nav 36 saetên dawîn de 6.000 balafirên Hevalbenda 7.000 ton bombe avêtine hêjagehên axa Germanistanê û yên axa vegirtî

Şeva yekşembê 1.000 balafirên brîtanî 2.600 ton bombe avêtine Leyipzigê- Rojên şembî, yekşemb û duşembê, 4.000 balafirên emrikanî 2.000 ton bombe berdane Stutgartê û hêjagehên axa elemana ên din: Şevadî 1.000 balafirên brîtanî 2.400 ton bombe dîsa berdane Stutgartê.

## DERBÊN ORDIYA SOR

MOSKÛ—Di şerê eniya Volkov û Lenîngradê de, yê ko ev mehek e dom dike leşkerên rûsî 90.000 elemanî safî kirine, 7.200 hêsîr girtine, 97 balafir, 275 tang, 1.962 top, û 28 firqeyên elemanî ji hev de xistine,

MOSKÛ— general Koniev bi paya mareşaliyê, hatiye ser bilind ki rin, Di Ordiya Sor de niho 12 mareşal hene.

LONDRE— Îro serêsibehê di Londrê de işareta talukê hatiye da yîn, lê hindik dom kiriye.

QAHIRE — Di Ordiya yewnanî a azakirina welêt de 2.500 serbend û zabit hene.

ZÛRÎX— Rojnama Svîçreyî Noye Zurîxer Çeytung dinivîse: Ordiya Sor, her çend jî dinya zivistan, hewa ne xweş û erd têrherî ye, hero asêgeheke elemanî zeft dike. Serfiraziya leşkerên rûsî di eniya Lenîngradê de, zefereke gelek hêja bû. Divê mirov ji bîra me ke; her cara ko elemana bawerdikirin Ûris westiyan e, Ordiya Sor bi êrîşeke nû, eleman perîşan kirine.

Di axa Italyayê de, hevalbendan xisarine giran gihandine û digihînin elemana, û dema êrîşa Ewrîpayê — eniya diwemîn — hin bi hin nêzingtir dibe. Di Pesîfîkê de jî qiwetên Hevalbendan û yên emerîkanî li zehf deran zora Japona birine û gelek giravên hêja standine.

## EMIRNAMA STALIN

MOSKÛ— Bi hênceta sersala Ordiya Sor a 26'an Stalîn emirnama xwe a rojîn de gotiye: Êdî dinya dizane ko eleman ber bi perîşaniyê ve diçin. Êmê serê nazîsmê bi perçiqînin, û eleman vî tiştî dizanin û niho xelasiya xwe di nifaq û fesadiyê de dibînin, fesadiya ko dikin bêxin nav dewletên Hevalbendan.

Lê destbratiya Hevalbendan xurt e, û tifaqa Hevalbendan ji pirsên ko bi jiyîn û heyîna wan girêdayî ye, derketiye.

Heta niha elemana gava bitenê eniyekê de şer dikirin, dijminên xwe dişkênandin lê îcar Ordiya Sor vî tiştî ber meqlûb kiriye û eleman şkênandine û sibe ko carekî hevalbendên me jî direjî elemana kirin, ew yekcar perîşan bibin.

MELBURN— Di Nû—Gineyê de qiwetên emerîkanî 34 geminiyên japonî bin av kirine.

LONDRE — Safîkirina pênc firqeyên elemanî ên ko di axa Nikopolê de dora wan hati bû girtin, bi hatina qiwetên rûsî ên teze ber bi xelaseka xwe ve diçe.

MOSKÛ— Eleman lez û bez ber bi Xersonê ve xwe bi şûnda dikişînin. Eleman dev ji çek û posatan ber dane û dikin xwe bi lez ji lepê Ûrisa xelas bikin, yên ko li pey wan in.

## MINAREYEK



Tiliya ko yekîtî û mezinahiya Xwedê şanî me dide.

Ezan bi erebî ye: di erdê me de hin radibin, bi zimanê xwe ko miletê me seh nake, ezanê dixwînin. Guhê me ji ezana erebî hez dike, heke ezan bi zimanekî din divê bête xwendin, divê bi kurdî bête xwendin, û bête gotin: Xwedê mezintir e, ê mezintir Xwedê ye, rabin nimêjê!...

## Sersala Ordiya Sor

Bi hênceta Sersala Ordiya Sor a 26-an hemî serekdewletên Hevalbendan pîrûznameyine hêja şiyandine Mareşal Stalîn û pê qedrê mêrxasî û egîdiya leşkerên Sovyetistanê û serfermandarê Ordiya Sor Mareşal Stalîn girtine.

CEZAYIR— Radyoa Frensê dide zanîn ko duhî serê sibehê tangên Hevalbendan di eniya Anzioyê de, êrîşî elemana kirine, ew şkênandine û ketine çeper û penahên di wan.

LONDRE— Duhî gava refên emerîkanî, êrîşî axa Germanistanê kirine, bombeavêjên emerîkanî û nêçîrvanên Hevalbendan ko ew ref dihemandin 126 balafirên elemanî xistine erdê.

# DEMA NIHA

MOSKÛ— Yekîneyên Ordiya Sor gihane pêşiya Pskovê; Pogorelka hatiye standin, ev şaristan ji Pskovê 10 kilomêtir dûr e, û dikeve bakurê wî.

LONDRE — Refên emerîkanî ên mezin, ji bombeavêjên Kelehên Firok bihevketî direjî axa Germanistanê kirine û li Brunswîkê xistine.

LONDRE – General Dîtmar şevêçûyî gotiye: eniya diwemîn û şerê vegirtina erdê Ewripayê, ber bi destpêkirinê ye. Qiwetine behr û hewazî û reşayiyê ên mezin xwe pêkanîne.

CEZAYIR— Di eniya talyanî de, eskerên brîtanî ji nû ve bilindahiyek standine, refên hevalbendan balafirgehên Gîdonya, Lîtoriyo û Marçîliyeyê bombardiman kirine.

LONDRE — Hefta borî çekê Hevalbenbanê hewayî 18.000 ton bombe avêtine hêjagehên elemana, û 777 nêçîrvanên elemanî xistine erdê, ji Hevalbendan 464 mekîne venegeriyane warên xwe.

NÛ DELHÎ — Ev 24 saet in eskerên Hevalbendan erdê Mayu-yê ji dijmina paqij dikin; qiwetên Japonî ên mayîn, piştî ko bi rik pê dane erdê xwe bi şûnda dikişînin, Japon dikevin erdê ku jê dest bi êrîşan kiri bûn.

LONDRE— Kelehên Firok, di penaha nêçîrvanan de direjî axa Frensê kirine û li hêjagehan xistine, refên emerîkanî rastî nêçîrvanên dijmina ne hatine, lê topên ber balafira gelek şixulîne.

# SEVOKA HECI

— 3 —

Wê gavê Mîrekê Palû rabû, çû melakî donzdeilim anî, ew melayê donzdeilim, pêlê kitêbê li hevdu qulibandin go:

Ya Mîrekê Palo, bi Xwedê tu destûra lawê xwe didî bide, heger tu nadî, wê lawê te, har û dîn bibe, wê li çolê keve, ismê aqil di serê Mîr MehMûd ne maye, derdê dilalê ketiye !

Tew lo dilo, tim lo dilo! ...
Dil bi kulo dilo, hêsîro dilo, tîra xeybaniyê lê keto dilo...

Bavê Mîr Mehmûdê Cindî, rabû, ser piyê, ciwaniyek ji Mîr Mehmûdê Cindî re ji tewlê bi der aniyê, teng û bertengê vî ciwanî şidandiyê, xurcikek zêra ji Mîr Mehmûd re dagirtiyê...

Tew lo dilo, tim lo dilo, hêsîro dilo, dil bi kulo dilo....

Mîr Mehmûdê Cindî rabû piyê mînakî dihnekî ji dihnên Xwedê. ciwanî bi destê xwe girtiyê, bi ser pişta wî ciwanî ketiyê, ji bajarê Mîrekê Palo bi der ketiyê...
Hey heram be; ismê aqil li serê Mîr Mehmûd tuneyê...
Xatir ji dê û bavê xwe ne xwestiyê; heyanî ko qederê mişwarkî ji bajêr bi dûr ketiyê ji nû de, dê û bavê Mîr Mehmûdê Cindî, rûniştin halê hevdu digiriyan...

Hey heram be, ji Mîrê Mehmûdê Cindî pê ve, ismê lawê wan tuniye, Mîrê Palo, ji pîreka xwe re gotiye:
go malxerab, me lê helal ne kir, tab û sefîliyê, ji nû ve, dê û bavê Mîr Mehmûd, daw û der lingên xwe rakirin «hilgaftin» dû Mîr Mehmûd ketine...

Çi qey ban dikin, ban na kin, Mîr Mehmûdê Cindî li xwe venegeriya;

Heya ko nîzîkahî li Mîr Mehmûdê Cindî kirine, ji nû de Mîr Mehmûdê Cindî li ser piyên we vegeriya wiha nêrî ko dê û bavê wîna dûwê de dibeziya, ji nû ve Mîr Mehmûdê Cindî serê mehîna xwe ragirtiye, go :

ya bo Xwedê hebîna, hewala we çi ye? go: lawo te berê xwe da welatê xêrîbiyê, ko me li te helal ne kir tab û sêfîliyê ko li dinyayê me bi te re diye. Tew lo dilo, tim lo dilo,dil, bi kulo dilo, hêsîro dilo...

Wê gavê Mîr Mehmûdê Cindî, hêdî ji ciwaniyê xwe şiha, peya bûyê çû destê dê û bavê xwe maçî kiri yê go: Xwedê we hebîna, honê li min helal bikin tab û sêfîliya ko we bi min re dîyê...

Wê gavê, hêstira di çavê dê û bavê Mîr Mehmûdê Cindî re avêtiye...

Bavê wî got: lawo, min li te xweş helalbe,ta b û sefîliya komin bi te re dîye. Diya Mîr Mehmûdê Cindî go:

Mi li te xweş helal be şîrê sipiyê..

Xwdê bike tim li dinyayê bi mûm û çira be, daim li pêşiya te vêketiyê... ji nû de, Mîr Mehmûdê Cindî, xatir ji dê û bavê xwe xwestiye,
Bi ser pişta şiho ket, berê xwe da Oxirê, pişta xwe da felekê; hêdî, hêdî dimeşiya...

Hey heram be Mîr Mehmûdê Cindî, ji gava Xwedê xulqa wî daye derê bajêr bi çavê serê xwe ne dîyê. Qonaxik hilanî û yek danî
Qonaxa sê roj û sê şeva li yek tûşê ajotiyê...,.

«ne qediyaye»

# QURBAN

Yadê qurban...
Serê sibehê, ne tî me û ne birçî me
Mal mîrato, li ser kanîka
Eyinsincê rûniştî me
Xelkê aşiqê malê dinê
Ez bi tenê aşiqê keçka file merdinlî me
Ha wer delal !...
Ev çem ji çemên Bişêriyê
Kelekvana kelek berda pê gemiyê
Ciwaziyê xweş e, ji biçûkiyê;
Belê were tewafa sing û berê Memikê bi sêriyê...
Yadê qurban!...
Serê sibê, kew im û kewê reş im
Li serê xaniyê mala bavê te dimeşim
W'ez aşiqê bejna zirav û çavê reş im
Belê, Gewrê, serê sibehê kew im
Û kewê nêr im;
Li ser xaniyê mala bavê te diçêrim;
W'ez aşiqê bejna zirav, çavê zer im
Destmal sor î, pêşmal şîn î, gul bi gul î,
Keleş Gewrê, ez koçer im, narim deştê
W'ez xencera zîv û zêrê nadim piştê
Belê keleş Gewrê
Sê cara lêxisti bû li teniştê.

# MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞITIYÊ

## CENG & BIHINGEH



Kralê Ingilistanê û Şahinşahê Hindistanê Xwedî Tac û Text CORC VI.



Serekwezîrê Brîtanya Mezin M. Çorçil Balafirvanekî Hêja,Bi Qîmet e.

STOKHOLM– Danezana elemanî a piştî nîro mûkir tê ko di bakurê Krivoy Rogê de yekîneyên Ordiya Sor xetên elemana neqeb kirine.

LONDRE— Refên hevalbendan li meha Kanûna Pêşin 400, a Paşîn 665 û a Sibatê 800 caran direjî axa Germanistanê kirine.

www.arsivakurdi.org

2ème ANNEE — LUNDI 6 MARS 1944 — NUMERO 40

# LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél. : 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire : EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 15 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 15 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

## Vers la Victoire

### CHRONIQUE HEBDOMADAIRE DE LA GUERRE

Trois armées russes, libérées par l'occupation de Krivoy Rog s'avancent au travers de la steppe en direction de Kherson, de Nikolaiev et du Bug avec comme but Odessa et la Roumanie. Dans toute cette région de Krivoy Rog les forces allemandes sont en pleine retraite, retraite qui, sur plusieurs points, se transforme rapidement en débacle. De fait, la Wehrmacht a résisté au maximum de ses forces. Krivoy Rog, cité industrielle modèle construite au moment du plan quinquennal avec de gigantesques ateliers métallurgiques, au centre d'un bassin minier d'une richesse inouie était géographiquement merveilleusement située. L'ennemi avait parfaitement compris l'importance de cette base. Il l'avait fortifiée avec un soin particulier et pendant 4 mois il put résister aux assauts presque ininterrompus de l'armée rouge. Mais, durant les trois dernières semaines de la lutte, la pression soviétique s'était considérablement accentuée. La situation de la Wehrmacht devenait intenable. Ainsi, peu à peu se termina la reconquête de l'Ukraine, de cette Ukraine dont, il y a deux ans, un allemand disait : Si nous pouvions savoir toutes les richesses que le Reich en tire nous serions émerveillés. L'émerveillement est fini. Avec Krivoy Rog est arraché à l'Allemagne le dernier centre industriel vital qu'elle avait conquis. Après les pétroles du Caucase, après le blé du Kouban, après la houille du Donetz et le manganèse de Nikopol, le fer de Krivoy Rog.

En Méditerranée, toutes les opérations, terrestres du moins, sont momentanément suspendues. Kesserling a échoué dans ses tentatives. Las alliés demeurent fermement accrochés à leur tête de pont d'Anzio — Nettuno. Epuisée par ses derniers assauts, la Wehrmacht se regroupe. La 5ème armée met à profit ce répit pour s'incruster plus profondément encore sur ses positions. Il ne parait plus possible à l'ennemi d'espérer une victoire sur ce front.

Dans les airs, les opérations ont repris plus intenses que jamais. L'aviation américaine qui, bientot, dépassera en effectifs la R.A.F. (quand nous disons aviation américaine nous entendons les seules forces basées en Grande Bretagne), vient de lancer trois raids majeurs tous dirigés contre des centres ennemis de production aéronautique : Eschersleben, Halberstadt, Bernberg où sont assemblés les Junkers 88 et Regensburg en Bavière, centre de production des chasseurs Messerschmidt. Les Forteresses volantes et les Libérators qui ont effectué ces raids venaient de Grande Bretagne et d'Italie. Ces raids d'ailleurs quelque soit leur ampleur, quel que soit leur fréquence ne sont encore qu'un pâle reflet de ce qui attend l'Allemagne au moment de l'invasion.

## KURDISTAN

### - I -

Durant ces dernières années, le Kurdistan s'est souvent trouvé en vedette sur le théâtre de la politique orientale. Il sera probablement encore appelé à y jouer un role important. Sa situation géographique, d'une part, les aspirations de son peuple, de l'autre, tout semble l'y convier. Il nous a donc paru utile de renseigner sommairement le grand public sur ce pays encore mal connu.

En effet, peu d'étrangers, si l'on excepte de rares voyageurs et quelques orientalistes encore moins nombreux, se sont occupés des Kurdes. La seule publication d'ensemble qui leur ait été consacrée jusqu'ici est le bel article de W. Minorsky, dans l'*Encyclopédie de l'Islam* ; il demeure malheureusement difficilement accessible, en dehors des grandes bibliothèques, et surtout d'une lecture peu aisée pour qui n'y est pas préparé par l'étude de l'histoire générale de l'Asie.

Ce que nous voulons offrir à nos lecteurs, ce n'est ni un travail scientifique, ni un tract de propagande. Nous n'avons d'autre ambition que d'exposer, avec la plus grande objectivité, et le plus brièvement possible, des faits sociologiques et historiques qui devraient être connus de quiconque s'intéresse aux choses de l'Orient.

### LA GEOGRAPHIE DU KURDISTAN

Il n'entre pas dans le cadre de cette notice de définir exactement les limites du Kurdistan : la présence d'importants ilôts kurdes dans des régions souvent fort excentriques (au Khorasan, par exemple), celle de quelques groupes allogènes (arméniens, assyriens, tcherkesses) à l'intérieur de ses frontières, et surtout sur ses confins, nous obligerait à nous perdre dans le détail. Nous nous contenterons donc d'indications sommaires, permettant au lecteur de reporter *grosso modo* sur la carte les contours de ce pays.

Situé en plein coeur de l'Asie Mineure, le Kurdistan occupe la plus grande partie de la région montagneuse qui s'étend entre la Mer Noire et les steppes de Mésopotamie, d'une part, l'Anti-Taurus et le plateau iranien, de l'autre. Il est entouré par une ligne, dont le tracé est approximativement le suivant :

à l'Ouest, du Kurd Dagh à Zara ,

au Nord, des environs de Zara à ceux de Kars,

à l'Est, de Kars au lac d'Ourmia ; elle se confond ensuite avec les frontières orientales des deux provinces iraniennes de Kurdistan et de Kirmanchahan, pour s'infléchir en direction de Khaniqin (en Iraq) ; (1) ;

au Sud, des environs de Khaniqin au Djebel Sindjar, par Kirkouk et Altun Koupru ; puis du Djebel Sindjar au Kurd Dagh, en longeant la frontière syro-turque, qui se trouve à une cinquantaine de kilomètres plus au nord, et en se courbant légèrement pour éviter la région d'Alep.

Un simple coup d'oeil sur la carte permet de saisir les traits saillants de l'aspect physique du Kurdistan. C'est un pays de hautes montagnes, comprenant une série de plissements axés du Sud-Ouest au Nord-Est, et que les vallées du Tigre de l'Euphrate et de leurs affluents divisent en un certain nombre de massifs nettement délimités. Les sommets les plus élevés, comme le Djoudi, le Sipan, ou l'Ararat, atteignent des altitudes voisines de 5.000 mètres. Les plaines sont rares, sauf dans le Sud et en bordure des grands fleuves.

Le climat se distingue par de grands écarts de température, et par des hivers particulièrement rudes : la neige recouvre presque tout le pays de décembre à avril.

(*à suivre*)

ROBERT SURIEU

*(1) Les provinces du Louristan du Poch-té Kouh, ainsi que le pays Bakhtiyar sont souvent considérés comme faisant partie du Kurdistan.*

## LA DEFAITE ALLEMANDE VUE PAR MASARYK

**A l'occasion du 94ème anniversaire de la naissance de T. G. Massaryk, grand philosophe et homme d'Etat, Président-Libérateur de la Tchécoslovaquie, nous présentons à nos lecteurs quelques passages clairvoyants qu'il a écrits, il y a presque un quart de siècle, sur la défaite de l'Allemagne.**

*La théorie selon laquelle l'Allemagne a été « frappée dans le dos » et que la victoire des Alliés était due uniquement à la démoralisation de l'Armée, à l'agitation socialiste et à la révolution interne, est insoutenable. Même si elle était vraie, cette théorie fournirait une nouvelle preuve des vues bornées des Allemands et de leur ignorance de leurs propres conditions intérieures. Si on doit prendre en considération l'influence des Sociaux-Démocrates Allemands, on ne peut pas oublier non plus l'influence des Socialistes et des Pacifistes dans les pays alliés ; et les Français ont également une théorie d'un « coup dans le dos » qui, selon quelques-uns d'entre eux, empêcha Foch de traverser le Rhin et de pénétrer en Allemagne. La vérité est que tous les pays belligérants se sont simultanément lassés de la guerre, — et pour les mêmes raisons.*

***

*Mais la défaite de l'Allemagne n'était pas due uniquement à l'insuffisance militaire. Comme le disait avec raison Clausewitz, la guerre est la poursuite de buts politiques, à l'aide d'autres moyens ; et l'Allemagne avait estimé d'une façon erronée la situation en Europe et dans le monde, et même la situation régnant en Allemagne. Le projet pan-germaniste — l'Armée allemande et ses cadres d'officiers étaient pan-germanistes de tendance — était savant, mais de qualité douteuse. Les Allemands se sont mépris sur la balance des forces politiques, militaires et économiques ; ils se sont sur estimés ; eux et leurs alliés, et ont sous-estimé leurs ennemis. Au début, ils n'ont pas apprécié l'Angleterre à sa juste valeur et, jusqu'au dernier moment, ils ne croyaient pas à la mobilisation militaire de l'Amérique. A l'aide d'expériences, ils prouvèrent pour leur propre satisfaction que les Américains ne pourraient pas traverser l'Atlantique ; et dans leur propre imagination, ils exagérèrent la puissance des sous-marins, dont ils possédaient, dans tous les cas, un très petit nombre. Les Allemands ne prirent pas non plus suffisamment en considération la supériorité industrielle des Alliés. Les Anglais furent bientôt en mesure de tenir tête aux sous-marins allemands. Les Américains inventèrent des gaz plus mortels que ceux des Allemands, mais s'abstinrent d'en faire usage pour des raisons humanitaires. Et de même que les Allemands comptaient trop sur les forces matérielles et sur le mécanisme de l'organisation, ils ne purent comprendre les forces et la puissance morales des Alliés. Ils crurent que la France était dégénérée et se montrèrent aveugles à la dégénerescence de l'Autriche-Hongrie. De fait, ils furent battus sur le terrain par leur propre science, leur histoire, leur philosophie, leur politique et par le militarisme prussien :*

### UN ILLUSTRE SAVANT FRANÇAIS

## BRANLY

*Il y a quatre ans mourait, à l'age de 96 ans, un grand Français digne des hommages de l'Histoire. l'illustre savant Branly.*

*Branly est l'homme qui «a découvert le principe de la T.S.F.»: c'est le titre qui lui fut décerné par le «Journal Officiel» à l'occasion de son Grand Prix à l'Exposition de Paris de 1900.*

*Son invention est officiellement datée du 24 Novembre 1890*

*Physicien de carrière, Branly n'était pas un savant d'occasion. Il sortait de l'Ecole Normale Supérieure. En 1873, il fut agrégé des Sciences Physiques et Naturelles, puis, plus tard, docteur en médecine.*

*Chef-adjoint au laboratoire de recherches de la Sorbonne en 1875, Branly semblait devoir passer toute sa vie dans les bâtiments de la Rue St. Jacques et de la Rue des Ecoles à Paris. Il était Maître de Conférences et professeur; et sa thèse de doctorat sur le potentiel électrique l'avait signalé à l'attention de ses pairs. Mais, pour des motifs strictement personnels, le jeune homme quitta l'Université. En réalité, il brisait une carrière qui s'annonçait brillante dans la hiérarchie officielle, pour entrer à l'Institut Catholique de Paris.*

*Ce surprenant changement d'orientation devait peser sur toute la vie du savant.*

*C'est en 1890 que Branly signa l'acte de naissance de la T.S.F. qu'on appelle communément la radio — ou encore téléphonie et télégraphie san fil.*

*En 1891, il découvrit le rôle des antennes.*

*Grâce à lui, chacun de nous, se mettant à l'écoute, presque à tout instant du jour et de la nuit peut entendre la voix de l'univers, offrir à son oreille cette divine caresse de la musique.*

*Par la radio, Branly a fait, de la mélodie, de la symphonie, du chant, un cadeau royal, indéfiniment renouvellable, à tous les peuples.*

*Mieux encore. Il a donné à notre intelligence cette fierté sans égale de pouvoir entrer directement en contact avec les intelligences les plus variées, les plus hautes du siècle, en recevant leurs échos. La radio nous envoie la pensée des orateurs, des artistes, des professeurs, des hommes du jour, de tous ceux, en un mot, qui ont quelque chose à dire au monde.*

*La radio est l'enchantement de l'esprit.*

*Notez qu'elle devient, à la rencontre toute fantaisie et toute grâce, puisque ses émissions s'adressent quelquefois aux petits enfants sur qui elle déchaine, à volonté, le rire, l'enthousiasme, les trépignements de plaisir. La radio rend vivante et immédiate la notion, trop ordinairement abstraite, de l'humanité.*

*Les postes de nos appareils captent les ondes de partout. Qu'est-ce à dire sinon qu'ils font entrer dans le domaine de notre conscience les sentiments et les idées qui circulent sous toutes les lattitudes? Ils font plus. A certaines heures angoissantes, ils reçoivent et déposent en nous les appels de détresse que projette le S.O.S. dans l'immensité de l'espace. Ils nous signalent qu'en un point de la planète, il y a des humains en perdition qui réclament le secours des autres humains.*

*Mais à l'heure actuelle, la radio est au service de la guerre; et tout le monde connaît l'importance d'une telle arme dans le conflit actuel.*

*C'est le 29 Mars 1899 que fut réalisée, au dessus de la mer entre Douvres et Wimereux, la première liaison par «sans-fil». Le télégramme envoyé à cette occasion par Marconi à Branly rendit hommage au savant français. En voici le texte:*

Monsieur Marconi envoie à Monsieur Branly ses respectueux compliments pour le télégraphe sans fil à travers la Manche; ce beau résultat étant dû en partie aux remarquables travaux de Monsieur Branly.

*Lorsque Branly mourut, en 1940, il était Membre de l'Académie des Sciences depuis 1911, et Grand Croix de la Légion d'Honneur.*

L. L.

## DI WELATÊ ZEMBEQÊ GEWIR DE

Nivîsevan Grigorî Petrof | 17 | Wergerandok Qedrî Can

Yûnanên berî jî wisan dikirin. Soqrat, Fidias, Periklis û ên ku di babliska wan de rabûne, ji bo prensîpa jiyînê ev bingeh danîn.

— Di tu tiştî de îfratî ne lazim e. Divê meriv ne yek çav û ne yek cîhet be. Di her tiştî de îtîdal divê.,. Divê her tişt di zeman û di cihê xwe de bê çêkirin.

Xwediyê kitêba « Gulliver » Swîft, tenazê xwe, bi wan kesan kiriye ku ew bi xwe cûcene, mîna beqan, xwe dinepixînin, di ne pixînin. , dixwazin mezin bibin.

Swîft, ji van pêve henekê xwe bi merivên qelew, sermezin, hustu zirav û yên anormal dike û dibêje: Jiyîna wan mîna canê wan kirêt e.

— Ez û dostên xwe, em naxwazin û qebûl nakin, ku Finlanda me jî bibe mîna welatê yacûc û macûcan... Em, însanên anormal (ne te bî-î) naxwazin. Lê me navê, ku fînên me serî-vala û linggameş bin... Ew kesên ku ling-gameş û ser-mîh in, nabine hevalên îdêal (mefkure) a me.

—Hûn pêşveçûna fotbolê di Finlandayê, dibînin û dilxweş dibin Taqimê fotbolê we ya bi navê «Çîpên xurt» bi Taqimên Îsweçan, Norweçan, Danîmarkan re,musabeqe çêkiriye., heta çûne Mecaristanê jî.. ew qels kirine. Ji ber vê yekê bê payan dilê we xweşdibe. Lê yê min nabe.

— Ez divêm û hêvî dikim, ku li welatê me yî delal civatê wisan çê bibin:

«Fikrên xurt»..« Karên bilind» ..« Xebatên hêja»..« Gameşên bi şîr»..« Hêkên qenc»..«Toxumê hêja» ».. « wijdanê paqij ».. «Fikrên nû» H-p...

— Ez, dixwazim, ku hûn xortê fîn —ne Mecara tenê, Fransizan, Îngilîzan jî qels bikin, lê ne bi çîpên stûr û xurt, bi ilim û sene'tên nefîs, bi ticaretê, wan qels bikin

—Hûn, di van mucadeleyên xwe de, tenê bi dû qiweta çîp û zendan bikevin, hûn pir pêşve naçin. Serîyekî mezin jî, ji we re gereke. Ji serê berana hişktir, tune. Dilê min na xwaze, ku serê we mîna serê berana be. Li resmê Socrat û Herkules ên binav û deng bigerin, pêda bikin, û wan her diwan bi din ber hev, serê Sokrat, serê feylesofan e, ênîyekê wî bilind.,.ev cihê mejî ye.. tu dibêje qey, mejî di hundirê serê wî de dixwaze bi derkeve, ser û ênîya Soqrat, divê bîçimêdeye. Carekê bala xwe bidin heykelê Herkulês jî... Hûnê li ber saxlamiya eqlê vî pehlewanî, ji efsaneyê yûnanîyan ecêbmayî bimînin Bejn û bala wî mîna diregekî da çikandî ye... milê wî biçûk. . ênîya wî nizm e. Ev giş, quweta bedena wî nîşan dike. Lê ev qehreman kêm heş e; ne qehremanê fikir û manewîyatê ye.

Ez nabêjim ku serê Soqrat, an Herkulês ji xwe re bibijêrin, na... dibêjim,ku Gava hûn dixwazin bibin xwediyê lingê gameşan, serê Soqrat jî, ji bîr mekin. Ne bin xwediyê serê hişk... mîna keviran. Vî qaîdeyî ji bîr mekin:

Her tişt, divê di zemanê xwe de bê çêkirin, Gava zemanê kêfê hat, kêfê bikin. Ji welatê me re, ne tenê lîska fotbolê, lîskên îqtisadî, civakî, fikrî îctimaî jî lazim in. Ji miletê ku biçand û zanînê kêm mane, adetên xerab, me girin. Ew ên ku diçin Fransayê, Kafê şantanan hîn nebin yên ku diçin Almanyê ne çin bîra xana, yên ku diçin Îngilistanê jî bira lîska fotbolê tenê...., hîn nebin.

Mîna xortê Alman bi sedan civatê, «yekbûna fezîletê» çêbikin. Bira ev jî, ji we re dustûr be: Ganê sax, di bedena sax de ye.

Ey xortên Fîn! wezîfa we ne bilindkirin û firandina fotbolê ye, Divê hûn, şerefa milete Fîn bilind bikin û bi hewa bixin. Ji bo pêşveçûn û bilind bûna welatê me yî delal, cehd û xebatê bikin....

### Dê û Bav û Zaro

Ji xort û tovê nuh hatî re dayina terbiya qenc...ji bo hişyariya Finlandayê, Senelman û hevalên xwe hêvîya xwe bi vê mes'elê ve girêdan. xortanî li ber çavê Senelman çîrokeke pir şêrîn bû, û nuqta dilê wî yê hesas bû.

Senelman, carnâ xort li ber çavê wan tekdîr dikirin,lê gava ku merivê nav—sere bi ne qencî, behsa xorta dikirin, Senelman xort mudafee dikirin, û di got:

Kêmanî ne ji xorta ye, ji we ye.. Xort, çawa hatine terbiye kirin, wisan radibin. Terbiya ku hûn didin xortan çiye? Hêçî...

Dê, bi şuştina kincan, feraxan, bi rêjikrina malan û bi çêkirina xwarinê mijûl dibin. Bav jî, bi m'emûriyet, ticaret, sen'et û paletiyê...

Bi şev hatanî dereng li qehwe û çayxana, bi lîskan wexta xwe derbas dikin. Lê bi zarokên xwe re, qet mijûl nabin. Çima ku ji bo vî tiştî wexta wan tune. Paşê mujûli ya bi zariwan ve, meriv di westîne.Bi zarokên xwe re na peyivin., bi jîna wan re bendewar nabin.., di wextên xwe ên serbest de, bi wan şa dibin û paşê jî dibêjin!

—De xwe bi de alîkî, û ji xwe re bilîze, yanî, here ji serê min bi qeşê...., tu çidike, bike, tenê min ne rehet meke...

Bi vî awayî, heş, mejî. canê zarokan, mîna zevîyê ne ajotî,bejî,di mînin ; tiştek di wan de, nayê çandin.

Carna meriv, ji wan re, qala çêyî, rastî û hezkirinê bike jî, mîna kevirê hişk, ji wan re, ev peyiv biyanî tên.

Dê û bav, bi canê zarokên xwe re bendewar na bin. Heke bi bin jî, nizanin û nikarin. Gotinê wan ên, pûç, ji ruh û canê wan ê hesas re tu fêdê nakin.

Heke meriv, rastiyê bibêje, bi vî awayî, heke dê û bav, xal û xaltîk di nav malê de hebin jî, ew zarok tim sêwî dimîne, û sêwî mezin dibe.

Dinav hinek mal de, dibe ku hinek zaro baş tên xwedî kirin; cilên baş li wan tê kirin,û terbiya bede na wan jî tê mêze kirin.Lê terbiya ruhê wan îhmal dibe.Gava zarokên wisan, ne qene, derdikevin, divê meriv ecêbmayî ne mîne. Ev zarokên ha, bi vî rengî, bikevin nava jiyînê, çi dikarin bi kin?

Hûn, dê û bavê zarok inî carek ê, bi wijdan, bibêjin: Ev melşet û mubîtê ku hûn di nav de ne, ji tenmiye û terbiya seciya zaro kan re biker tê, ya na?

Ji zarokên xwe re:

—Derewa mekin, saxtekar me bin, ev kar ne qenc e ; gunehe... dibêjin... Lê ewê bi van gotinan xwe û zarokan bi hev re dixapînin... Û dîsan ji zarokan re dibêjin: Kesî me êşîn in.

Lê ew bi xwe ji van tiştan re guh nadin, zarok zûka bi ser rîpên wan ve didin. Ewilî ecêbmayî di mînin;

( ne qediyaye )

## PÊJINÊN DINYAYÊ

### Xebat - Fidakarî - Serfirazî - Serdestî



Refine brîtani ên mezin, jî balafirgehan bi hewa ketine û berê xwe dane hêjagehên erdê Germanistanê.

Di nav van çend rojên dawîn de 6.000 balafirên Hevalbendan 7.000 ton bombe avêtine karxane, febrîqe, destgeh û hêjagehên erdê elemana ên eskerî.



Xort in, ciwan in, dest bi karine dijwar dikin, û bi mêraniya xwe berevaniya heq û kewneyên cihanê dikin.



Cengkeştiyên Hevalbendan bi şev û bi ro di pêşiya peravên erdê xwe de karê nobetdarî û dîdevaniyê pêk tînin.